

Hevpeyvînek di gel Ehmedê Huseynî



Hevpeyvîn: Mesûd Xelef

Ez gulek ji narinca keservedanê û ji rengê efsanewî yê agirê sînema, ya ku bi rondikên payîzê û bi nehvirîna ji kevir û bi hawarhawara şîngîr a dayikên Amûdê hatibû vemirandin, pêşkêşî keviya kêla reş a vê bîranînê dikim

Amûdê ji bû helbestvan Ehmedê huseynî dihê çi wateyê, dîsan tu Amûda di hundirê xwe de cawa dibînî, dîsan cawa mirov danûstandinê di gel bajaran dikin?

Berî her tiştî, dê peyvîn, qisekirin û hewildana xwe derbirînê û hewildana ku mirov bikaribe bajarê zaroktiya xwe, bajarê miriyên xwe, bajarê xewnên xwe, bajarê şikestin û têkçûnên xwe, dîsan û piştî hevdeh salan ji Amûdê dîrketin, bajarê bêrîkirin û hesretê, dê peyvîn, di baweriya min de, sext be, dê bersivdayîn jî dijwar be, çimkî hîç bersivêk nikare wateyek xwe hebe û tu wate jî nikarin, di heman demê de, bersivê hilgirin, yek ji me di hundirê hezaran velerzîn û veteqînan de diji. Dişem bibêjim ku ev pirs pirsên jiyanê ne û yên rojane neş, yên ku kêlîk bi kêlîk di giyanê mirovan de dest bi teqîna xwe dikin.

Her mirovek bi şêwazekî ji şêwazan danûstandinê bi bajarê xwe re dike, herwisa digihêje astekê ku êdî bi renekî ji rengan danûstandinê bi hemî bajaran re bike. Bo nimûne, çemk û têgeha bajêr li cem San Jon Bêrs an li cem T.C.Eliot, Oktavio Paz û li cem an awayê danûsatandina Nîroda, cihêwaz û ne bi heman wate û şêwazî ne. Di derbirînê de.

qedera herî dijwar a ku mirov bikaribe di kêlîkên herî dijwar de hest bike, vê gotina xwe ez ê ji bo te bi vê kurte bîranînê bibêjim: sala çûyî dema ez hatim Bajarê Duhokê ji bo beşdarî vestîvala rewşenbîrî ya diwemîn bibim, ez ji Amedê dihatim di ber sînora re, şev bû, ez di ber Amûdê re derbas dibûm û bi tenê yek kîlometre di navbera min û Amûdê de bû, min li çirayên Amûdê meyze dikir, Amûd di şevistanê de bû û dilek li mile din parçe dibû, wî wextî min ev pirs ji xwe kir, Ehmed di vê keliyê de tu bêriya çi dikî ji Amûdê?!. Tişteyê nehate bîra min, ji bilî gora dayika min.

Gabiryêl Garsiya Matkiz dibêje: "welatê ku miriyên mirov lê nebin, tu caran nabe welatê mirov". Wate ew kesên ku penaber û koçber bibin

kengî dikarin peywendiyên giyanî di navbera xwe û wê axê de, wê cogirafiyayê de çê bikin?, bêgoman di wan kêlikên ku hindek bîr ber bi korahiya wê axê ve diçin, ew jî dema ku mirov li wan deran hinek dost, xoşewîst, heval li pey xwe bihêle, wan li bajarên koçberiyê wenda bike û bispêre axa wan welatan..

Derbarê pirsra bajarên, bersiva bajarên, ya herî zelal ku mirov pê têr bibe, ji derveyî pirsra bêrîkirin, hesret, mirin û şkestinên ku mirovê dahêner dikare wan di nivîsekê de yan tabloyekê yan jî di deqekî de biafirîne, ji derveyî pirsra hestariyê, Jon Berger dibêje: " Bajarê te xaniyê te yê pêşî ye, cihê jidayikbûn a te ye ango ew bixwe navenda hebûna te ye; navenda ku mirov tê de dest bi jîyanê dike dike: Li wî cihê ku navend e çar şax derdikevin û beşdarî jiyana me dibin,

Yek, berbi jor ve diçe, ku li wir mirov hînî hemî raman, têrmanên mîtafîzîqî, olî û bi asîman û hemî tiştên ne diyar ve girêdayî, dibe.

Dû, şaxek jî ber bi jêr ve ku li wir em hemî kesên ku em ji wan hezdikin, em wan li wir diveşêrin. Ango goristanên me li wir in.

Sê, şaxê ku berbi çepê ve diçe, ku li wir diwaroj e, xewn in, hêviyên mirovan in.

Çar, şaxê berbi destê rastê ve ku bîranîn in, teqîna hiş e. tal û şêrîn, şîn û şadî.

Hemî êstgehên wî zarokî gav bi gav li wê axê, li wî cihî tiştên herî biçûk ên wî bajarî di hindirê wî de werdigirin û bi taybetî dûrketina ji wî bajarî, wate ew tiştên ku biçûk in, wexta ku em li wir in bi bajar re dijîn serincê nakişînin lê piştî ku mirov wan winda dike êdî ew dest bi vejîne dikin, ji ber ku eger ew tişt hêdî hêdî di hindirê mirov de ne teqîn wî wextî em rû bi rûyê pirsekê dibin ku gelek tirsînak be, lewma jî gelek kesên ku dûr ji welatên xwe ketine rastî nexweşiyên derûnî bûne, sedem jî bi çî awayî şîrovekirina hebûna mirov li wê cogirafiya nû û bi çî awayî mirov dê xwe têbigihîne ku mirov ji wê navendê hatiye birîn.

Ma helbestvan ew e yê ku bi tenê êş û nexweşiyên wî hene, an ku di şert û mercên dî de jî helbestvan derdikeve û dibêje ez heme ?.

Bi awayekî ji awayan mirov dikar bibêje ew ji sedemên bi gewedekirna wê behirmendiyê ye, lê bi tenê êş mirov nake helbestvan, pêdiviyê bingîhek hebe, ji wî bingîhî jî behirmendîyek hebe, hindek girûgirift û hindek sedemên destnîşankirî û hindek eger li derdora wê behirmendiyê hebe û danûstandinê bi wê behrmendiyê re bikin da ku ew behrmendî biteqe. Ev nayê wê wateyê ku em bibêjin ji destpêka dîrokê û her ji dema Yonana kevin wek têkist û helbestên ku hatine nivîsandin, kesên ku destpêk li vir behrmend bûn li dora wan her wextî şer, birçîbûn, aloziyên xwezayê bûn, her wextî hebûn û heger em bala xwe bidinê divê em bibêjin ku her kesê li pêşberî êşê bisekine pêdiviyê helbestê binvîse, lê di hebûna behiremendiyê de û amedebûna hindek



eger û sedemên ku dikarin wê behiremendiyê bi gewde û berceste bikin, biteqînin û hindek asoyan li pêşberî vekin hetanî ku ew, ez û tu em bizanibin ku ew behiremendî êdî, xwe bi xwe dest bi vejînê dike, dest bi ragihiandinê dike. Heger ez behsa xwe bikim, min heta niha tu wextî dema ez kêfxweş bûme, min helbest ne nivîsandiye, lê ez vê nabêjim ku her kes wesa ye, ji ber ku ev rewş li cem her yekî dihête guhertin û her helbestivanek li gor xwe atmosfer û seqayekî xwe yê taybet heye ji bo nivîsînê.

Bikaranîna ziman di helbestê de divê çawa be. Helbestivan û ziman divê girêdaneke çawa hebe di navbera wan de ji bo nûjenkirina helbestê bi wî zimanî. Dîsan erkê helbestê çine?

Di bingeha xwe de her helbestivanek hewildana wî ya seretayî ew e ku bikaribe di hindirê zimanê ku pê derdibire û xwe radigihîne şewazekî xwe bigire, ji ber ku kesê helbestivan di hemî serdeman de rih û giyanê hebûna wî ziman e, ew ziman jî ne zimanê wî yê takekesane ye, belku zimanê netewekê ye, ji ber ku ew kurê civatekê ye...yê bajareki ye, yê malbatekê ye û her ku mezin dibe dibe kurê welatekî, dibe kurê neteweyekî. Di wê navendê de perwerde dibe, hest, nest, xewin, êş, birîn û kul li wir çê dibin, li wê cogirafiyaya destnîşankirî çê dibin. Li vir ev pirs dihê, pirsê ku çawa her yek ji me bikaribe di hindirê vî zimanî de, çêja xwe, tama xwe û şewazê xwe yê derbirînê biafirîne, dîsan bikaribe bi xwe hindek alavan bi dest bixe ta ku bikaribe wê kesayetiya helbestê ku bi navê yekî girêdayiye biçespîne, lewma jî her kesek wexta ku danûstandinek taybet bi wî zimanî re bike û hetanî astekî tê bigihêje ku bibêje pêdiviye ez xwedan zimanek taybet bim û ew ziman jî dema ku hat û beşdarî di avakirina helbestê de kir, divêt zimanê helbestê be,

ne ku zimanê xelkên kolanê be.

Bê goman di birêveçûna nivîsandinê de her yek wê ezmûneke wî çê bibe, di wê ezmûnê de formekî xwe werdigire, şewazekî ji derbirîna xwe werdigire, eger hat û şiya wê taybetmendiya xwe ya zimanî bidestxîne, wî çaxî dikare wan fakterên din jî berhev bike heta ku em bikaribin bibêjin ku helbesta Ehmedê Huseynî ne weke ya Cegerxwîn e bo nimûne.

T.C.Eliot di lêkolînekî xwe de li ser erkên helbestê yên civakî dibêje: "di nav babetên edebî de helbest babetek şofînî ye" şofîniyeta helbestê û regezperestiya wê jî ji zimanê taybet yê helbestê dihê, ji ber ku helbest xwedan zimanek taybet e di nivîsandinê de, lewma jî şofîniye. Derbirîna helbestê jî xwe dispêre her tiştê xelkên ku xwediyên wî zimanî ne, wan jî di hindirê çand, kultur, dîrok, rabûn û rûniştin, filoklor, jiyana û mirinê de zimanê xwe gewde kirine, dema ku yê helbestivan jî dihê danûstandinê bi wî zimanî re dike, wî wextî ew danûstandinê bi rih û giyanê wî miletî re dike, ji ber van sedeman gelek caran dibêjin ku wergerandina helbestê gelek bi zehmet e, ji ber ku rih, giyan, gêwil, kesayetî, taybetmendî û dîroka derûnî ya wî zimanî dihê wergerandin.

Dîsan T.C.Eliot dibêje: "miletên ku dixwazin ne mirin, hewil bidin ku her gav helbestivanên mezin çê bikin."

Li cihekî din dibêje: "xelkên ku bindest in dema ku têdikoşin ji bo ku welatê xwe rizigar bikin, di bingeh de ji bû rizgariya zimanê xwe şer dikin, vêca di kêlîka ku ew netewe şer dikin û dibe ku ew şer sed salî dirêj bike, ew kesê helbestivan her di wê kêlîkê de dinivîse". Wate ew kesê helbestivan berî şer bi sedsalî nivîsandiye ji ber ku her ji wî wextî ve ew kes ermanca wî parastina ziman e. Lewma jî dibêjim ku her kes di dawîya dawî de, wek bîr û hebûn, şaneyên mirov li ku perwerde bûne? Li ku mezin bûne? Bihina axê û carina jî ez dibêjim rengê ba, bizava nepenî ya veşartî di hindirê van giyanan de yên ku li ber çavê mene û bi wan re em mezin dibin û di dawî de bîrdanika mirov bixwe, gelo li ku hatiye damezirandin?. Em ji ku hatine?. Di bersivdanê de mirov girêdayî cogirafiyayekiye, girêdayî giyaneki ye û çî tiştê ku di hindirê mirov de biqewimin wek bûnewer, dikarin kartêkirina xwe li wan kesan bikin yên ku ji mirov hez dikin û çî bi wan kesan re jî çê bibe wê kartêkirinê li min bikin. Her ji ber van sedeman bi êşên wî xelkî em diêşin, xelkên ku bêriya me dikin em bêriya wan dikin, kesên ku dixwazin me bibînin em jî dixwazin wan bibînin, kesên ku di vê kêlîkê de sînorek di navbera min û wan de heye, ew di wê xewinê de ne ku ew sînor rojekî ji nav me rabin, xelkên ku hevde sale ez bêriya wan dikim û nikarim wan hembêz bikim. Ev hemî jiyane, derd in, axîn in